Ji Penûsê Jinê Rastîya Jiyanê

RAPERÎN

Dîrok: Tîrmeh 2024 Hejmar:12 Biha: 1000

DÎSA JI NÛ VE HER BIJÎ ŞOREŞA JIN

ROJEV 2 DÎSA, JI NÛ VE HER BIJÎ ŞOREŞA JIN

NEZERIYE 3 Nezerîya Jîyana Wekhev û Azad

DÎROK 4 Ji Dîroka Şoreşa 19ê Tîrmehê Rûpelek

Dîsa, Ji Nû Ve Her Bijî Şoreşa Jin

Jin êdî ne jinên berê ne. Êdî dizane ku pergala baviksalar ne çarenûs e û wekhevîya jin û mêr gengaz e. Li dijî ev hişmendîya jinan paşverûtîya serdestîya mêr bi awayekî eşkere hîna xurtir bû.

Li tevahî cîhanê nakokîya zayendî her ku diçe kûr û bi tund dibe. Malbat, kargeh, dewlet... di şêweyê da cuda be jî weke cewherî bi heman astê qadên vî şerî ne. Di alîyekî da pergala kapîtalîst a serdestîya mêr tevahî mêrên ku bi wê ra di nava tifaqê da ne û di alîyê din da di serî da jinên karker û kedkar hêla vî şerî ne. Ger ku nakokîyek gihaştibe rehenda şer li wir pêvajoyeka nû ya dîrokî xwe ferz dike û tê wateya hatina dema şoreşa jinê. Tevahî cîhan warê şoreşa jinê ye.

Di sala 2010an da serhildanên Rojhilata Navîn û Efrîqaya Bakur negîhaşt asta şoreşa jinê. Ji ber ku amedekarîya kirdeya şoreşger têre nekir. Li Rojavaya ku parçeyê herî biçûk ê Kurdistanê ye rewş bi awayekî cuda qewimî. Tecrûbeya têkoşîn û berxwedana li tevahî parçeyên din bi tecrûbeya xwe ya cewherî ya Rojava ra gihaşt hev, ev serhildan gihaşt asta şoreşê û vê şoreşê di heman demê da xisleteka şoreşa jinê bi dest xist.

Li Rojava Mizgînîya Serdema Şoreşên Jinê ya Sedsala 21emîn

Jinan di nava tevahî sîstemên rêveberîya leşgerî û civakî da cih girt. Lê vê nikarîbû ji bo şoreşa jin têre bike. Zêdetirî vê rastênhevê meclîsên bi wesfên cuda ku bi navê jinan hatine avakirin, rêveberîyeka jin hate avakirin. Di pergala mêtînger û baviksalar da qulek vebû. Dewleta Tirk a ku di herêma me da nûnerê pergala mêtinger kapîtalîst a serdestîya mêr e bû dijminê herî mezin ê şoreşa me. Rizgarbûna Kurdan ji tehekûma mêtinger û di heman demê da weke şoreşa jinê pêkhatina wê tevahî paradigmaya dewleta Tirk a faşîst hejand. Bi rastî şoreşa Rojava ji bo dewleta Tirk a mêtinger pirsgêrêka mayîndetîyê-bekayê ye. Wê di şoreşa Rojava da têkçûna xwe ya dîrokî dît. Ji ber vê nûnerên cîhadê yên herî paşverû yên îslama polîtîk ên wekî DAIŞê ve tifaq çêkir. Teva rêxistineka ku tena mafa kolebûnê dide jinan

êrîşî şoreşa me ya jinê kir. Di dema ku wê digot "Kobanê ket dê bikeve"da DAIŞê têkçûna we ya herî mezin jîya. Şoreşa Rojava ya jin ji bo tevahî bindestên cîhanê û bi wan ve li ber xwe da û qezenc kir. Lê di esasê da ev bû têkçûna dewleta Tirk a mêtinger ku di DAIŞê da şênber bûye.

Erdogan lêgerîna xwe ya tifaqên nû berdewam kir û bi xwe jî rasterast di nav şer da cih girt. Efrîn, Girê Spî û Serê Kanîyê hat dagirkirin. Lê Şoreşa Rojava têk neçû. Li dijî pergala kapîtalîst, emperyalîst û baviksalar serî netewand. Şoreşa me 12 sal e li ser pêyane. Li dijî hemû êrîş û zextên paşverû yên serdestîya mêr berxwedana xwe berdewam dike.

Di bin tevahî van êrîşan da şoreşa me ya jin xisleta xwe bi israr parast. Hevpeymana civakî di vê wateyê da bû beyaneka vînê. Ji bo parastina xisleta şoreşa jinê, ji bo pihêtkirina bi zagonan û ji bo tunebûna bêbawerîya gelan gavên girîng hatin avêtin. Şêweya avabûna bajar û kantonan, pergala meşandin, daraz û zagondanînê ji nû ve hat girtin dest. Di milê mafa hilbihartin û hatin hilbijartin, û ji erkêkirin sîstemên demokratîk di çarçoweyekê da hat rûniştandin.

Weke berdewamîya vê, hilbijartinên cîgayî hat xistin rojevê. Ev, ji bo weke kirde tevlîbûna erkên rêveberîyê ya jinan û gel gaveka girîng e. Ev her çiqasî ku hilbijartineka cîgayî be jî ev qet girîngîya wê ya sîyasî lawaz nake. Dê hilbijartinên cîgayî bibe vegotina bawerîya şoreşê ya jinan û gelên me.

Li Bakur pêşketina hişmendîya neteweyî ya rêveberîyên cîgayî mêtingerîya înkarker paş xistîye. Komareka Tirkîye ya ku rola vê ya di têkoşîna wekhevî û azadîyê da tecrûbe kirîye heye li hemberî me. Dîktatorîya AKP-MHP jî, gelê me jî wateya hilbijartinên cîgayî dizanin. Dewleta Tirkîye hilbijartinên cîgayî yên Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî bi ev hişmendîya dîrokî girt dest û di hilbijartinan da careka din pirsgirêka xwe ya bekayê dît. Vîna gel ku di hilbijartinên cîgayî da derkeve holê tifaqa gelan û asta rêveberîya hevbeş ji bo Erdogan di hundirê xwe da têkçûneka stratejîk dihewîne. Hilbijartinên cîgayî weke sedema şerekî nû û berfireh îlan kir. Hewldana tirsandina gel da. Bi êrîşên li dû hev nîşan da ku hilbijartinên cîgayî çiqasî cidî digire dest. Bi partiyekî wekî ENKSê ku di şêweyê da Kurd e, lê hundirê wê AKP-MHP-PDKê ye hewl da ku di hundir da qeyranekê biafirîne.

Du alîyên vê hene. A yekemîn rastîya gel û a duyemîn kêmasîyên ku di milê ji bo vê pêvajoyê amadekirina gel da derketine holê. Elbet tena eleqederîya ji hilbijartinan ra ne pîvana yekane ye. Lê li dijî hilbijartinan eleqedarîya jinan mijareka girîng ku sekinîna li ser pêwîst dike ye.

Cudahîya di navbera eleqedarîya ku dewleta Tirk a faşîst, înkarker û mêtînger û eleqedarîya ku gelê me nîşanî hilbajirtanan daye bi awayekî aşîkar xuya bû. Hilbijartinên cîgayî li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî tê wateya "Ez vîn im, rê ve dibim û dê bi rê ve bibin, ez di nav şoreşê da kirde me". Lê li vir kêmasî û pirsgirêk derketin holê. Pêwîst e ku ev di heman demê da li hemberî erkên birêvebirinê bêeleqedarîya ya jinan û gelên me bê tespîtkirin.

Du alîyên vê hene. A yekemîn rastîya gel û a din jî di milê ji bo vê pêvajoyê amadekirina gel de kêmasîyên ku derketin holê.

Hilbijartin hatin taloqkirin û amadekarî berdewam dikin. Pêwîst e ku Jinên şoreşger, komunîst bi pêvajoyê ra têkîlîyeka çalak ava bikin. Divê hilbijartin weke derfeteka xwedî lê derketina şoreş û pêşxistina berpirsîyartîya girtina erkan bihê girtin dest. Divê civînên teng û berfireh ên "jîyana wekhev û azad" bihên berdewamkirin. Ji bo ku şoreş di hundirê malan da bihê avakirin pêwîst e ku em bikevin wan malan, mudexaleya wan jîyanan pêwîst e. Em dizanin ku jin, ji jinên pêşeng, ji JKŞê hêz digirin. Dema ku palpiştên saxlem ku dikarin pişta xwe bidinê dibînin xwebawerî bi dest dixin. Mêr jî di şertên hebûna jinên şoreşger, komunîst da nikarin ew qasî rihet tev bigerin. Wê demê divê em tena bang jinan nekin, di heman demê da divê em mal, gund, kolanên ku ew lê dijîn bibin. Dem dema parastina şoreş û mezinkirina rêxistinkirina jinan e. Ji bo ku jin karibin qeyda malbat û eşîr, xeyalên rizgarîya burjuva bişkînin û derbas bikin gelek erk dikevin ser milê jinên pêşeng. Em bi bawerî, coş û biryardarî têkoşîna xwe mezin bikin.

Em ji bîr nekin şoreş ronesans e. Derxistin û avêtina serbana ku ser nakokîyên zayendî digire ye. Di heman demê da derfetên çaresarîyê di hundirê xwe da dihewîne. Şoreşa me sala xwe ya 12 li paş xwe dihêle. Ji hemû jinan ra pîroz be.

Em hevseroka giştî ya berê Figen Yüksekdağ, Sabahat Tuncel û Gültan Kışanaka ku li her derê bi wêrektîyeka mezin şoreşa me parastin silav dikin.

Em destpêkê şehîdên jin û hemû Pirsusê ku di 20 Tîrmehê da rûmeta gelan di destê xwe da kirin al û berê xwe dan şoreşa me û li Pirsusê bi komkujîyeka namerdane bûn nemir bi bîr tînin.

Nezerîya Jîyana Wekhev û Azad

Şoreşa Rojava 12 sal berê di şert û mercên giran da li dar ket. Şoreşa me di hemû cîhanê da weke şoreşa jin hat nasîn. Berî şoreşê jîyana jinan di bin bandora kevneşopîyên paşverû da bû.

Jinan bi saya şoreşê gelek maf bi dest xistin. Her çend ev maf bi zagonan bên parastin jî di jiyanê da newekhevîtî berdewam dike. Em li dijî kevneşopîyên demdirêj û kûr têdikoşin. Ev kevneşopîyên paşverû rê li ber wekhevîya jin û mêr digire. Bi destkeftîyên ku me bi dest xistine jî xewna me ya jîyaneka azad û wekhev hîna jî pêk nehatîye. Em nikarin van kevneşopîyên ku berî hezar salan bigirin, di rojekê da ji holê rakin. Li hemberî pirsgirêk li herêm û cîhanê zêde dikin û şoreşan şert dikin.

Divê em li vir vê pirsê bipirsin? Em çawa dikarin rêya avakirina jîyana wekhev û azad ava bikin?

Dê derîyê azadîyê bi têkoşîna li dijî kapîtalîzmê bê vekirin!

Ji ber ku jinên ku ked û bedenên wan tên îstîsmarkirin û hebûna wan tê pûçkirin, divê em îro rêya sereke ya têkoşîna xwe ya li dijî pergala kapîtalîst serdest a mêr bizivirînin. Wekhevî û azadîya zayenda bindest dê bi guhertina têkilîyên hilberînê pêk were. Heta ku milkê taybet nayê civakîkirin jîyana wekhev û azadîya rastî ne gengaz e.

Di dîroka civakên biçîn da Ev girêdana sereke ya azadîya kolektîf a zayenda jinê ye. Ji ber ku azadîya jinê tena ne bi azadîya şexsî, di heman demê da bi azadîyeka tevahî zayenda jin gengaz dibe. Azadî û wekhevîya qismî ya ku me di jîyanê da bi dest xistine belkî gaveka biçûk e, lê ev li dijî kapîtalîzmê ne tiştek in. Ji ber vê yekê weke zayend tevgerîn, rêxistinbûn û redkirina ya li dijî zilma dîrokî şert e. Ev jî bi ronîbûna zayendî gengaz e. Ronîbûna zayendî bi zanistîya dîroka zayendî dest pê dike. Koletî û bindestî ne çarenûsa jinan e, ev çarenûs dikare biguhere. Fêmkirina vê rastîyê û têkoşîna li dijî vê ronîbûna zayendî ye. Di şoreşa me da jinan di qadên wekî rêveberî, ve tên dayîn. Serdestîya mêr û pêkhateya eşîrî ya ku tevî destketîyên azadîya jinê yên şoreşa me hebûna xwe didomîne, têkoşîna azadîya jinê û destketîyên wê paş dixe. Ji ber vê yekê divê em têkoşîna li dijî biryara eşîran a li ser jîyana jinan bilind bikin. Guhertina rêgezên civakî yên nenivîsandî yên ku bi sedsalan îmtîyazên mêran diparêzin û pêkhateya eşîrî ya ku li ser civaka Kurdistanê û Rojhilata Navîn serdest e, dê di têkoşîna wekhevî û azadîyê da bibe bendeka girîng.

Ev têkoşîneka dijwar e. Lê pêwîst e ku jîyana civakî li ser esasa azadîxwazîya zayendî ji nû ve were avakirin. Bi paqijkirina wê ji serdestîya mêr a ku jinan diperçiqîne em dikarin rêya azadîyê vekin.

Ji bo Wekhevîya Zayendî,

Pêdivîya Hilweşandina Dabeşkirina Karbeşîya Zayendî!

Wateya şkenandina zincîrên koletîyê yên di nava malê da li pêşîya azadîya jinê yek ji astengîyên herî girîng e. Karên malê yên ku weke erkên dîrokî yên jinan dihên dîtin, divê bibe karekî civakî. Divê hemû cureyên têkilîyên ku jinan di nav karên malê da difetisînin divê werin guhartin. Ji bo civakîbûna karên malê divê şert û mercên madî bên afirandin û proje bihên çêkirin. Pêwîst e ku hemû derfetên şoreşê ji bo civakîkirina hemû karên malê û xwedîkirina zarokan bihên pêşkeşkirin. Di vî warî da ji bo pêşxistina polîtîkayên alîgir ên jinan divê însiyatîf bihê bikaranîn. Ji meclîsan bigire heta komînan û şaredarîyan divê di hemû sazîyan da ji bo pêşxistina polîtîkayên alîgir ên vîna jinan xurt bikin bihên sepandin û jin bi awayekî hîna xurt bibin kirde.

Werin Beşdarî Refên JKŞê Bibin!

JKŞê di şoreşê da yek ji rêxistina jinan e. Dezgehên wê yên rêxistinî yên nîqaşkirin, girtina biryaran heye. Biryarên ku di hemû rêxistinên girêdayî xwe dihên girtin bi rêya meclîs, kordînasyon, lijne û komîteyan dikare kontrol bike. Rêxistinbûna di nav refên JKŞê da vîn, çalakî û hişmendîya azadîyê ye.

Werin em bi fêrbûna ji dîrokê meşa xwe ya ber bi sosyalîzmê ve xurt bikin.

û nakokîyên şoreşa me yên ku li ser esasê wekhevîya zayendî û azadîyê bêçaresar mane, divê em çi bikin? Gelo em ê vê newekhevîtîya ku di jîyana civakî da derketîye qebûl bikin? An jî em ê bi sedsalan li bendê bin ku wekhevî pêk were?

Elbet na! Divê ev were guhertin!

Zayenda jin û LGBTÎ+ di pergala kapîtalîzmê da bindest in. Pergala kapîtalîzm û serdestîya mêr girêdayî hev in. Jîyana jinan û zayendên bindest di vê pergalê da di her warî da tê îstîsmarkirin. Di şert û mercên kapîtalîzmê da nakokîya ked-sermîyanê, nasnameyên zayendên bindest û nakokîya serdestîya mêr roj bi roj kûrtir û tûjtir dibe. Ev gengazîyên gavên şoreşgerî bi pêşketina milkê taybet hêz di destê zayenda mêr da kom bû. Zayenda jinê di civakê da pozîsyona xwe ya kirdebûnê winda kir. Ji bo ku civak bibe xwedî jiyaneka azad û wekhev, divê jin vegere pozisyona xwe ya kirde. Divê jin di sîyaset, têkoşîna çînan, qadên leşkerî û her qada ku jîyan lê tê rêxistinkirin da berpirsîyartî bigire ser milên xwe û derkeve pêş. Ji bo vê yekê destkeftina hevserokatî ya ku jinan di şoreşa Rojava da bi dest xistîye mafeka pir girîng e. Weke jin divê em ji van mafan hêz bigirin.

Tunekirina azadîya jinê, ne tena sînordarkirina yek yek bi şexsê jinê sinordarkirina hemû zayenda me ye. Ji ber vê yekê têkoşîna azadîya jinê têkoşîna li dijî pergala serdestîya mêr e. hêza rêvebirin, hilberîn û di qada leşgerî da hebûn û hêza xwe îspat kirin. Ligel vê jî jin di jîyana civakî da hîna bi zayenda mêr ra wekhev nayên dîtin. Lê jin di warên herî girîng ên şoreşê da xwedî mafa gotin in û çarenûsa şoreşê dîyar dikin. Lê rojane dema ku karên xwe yên şoreşê diqedînin û vedigerin mala xwe rolên civakî berdewam dike. Destkeftinên jinan ên di qada sîyasî da hîna di hundirê malan da derneketîye holê. Ev rewş ne tena di mijara bargiranîyê da, di heman demê da pozîsyona newekhev a jîyan û pozîsyona newekhev navbera zayenda jin û mêr kûrtir dike.

Biryarên li ser jîyan û pêşeroja jinan hîna jî ji alîyê eşîr û endamên wan ên mêr

Ji Dîroka Şoreşa 19ê Tîrmehê Rûpelek

Şoreşa Rojava ya ku di tevahîya cîhanê da weke şoreşa jinê hat naskirin ji bo têkoşîna azadî û wekhevîyê hîna rê nîşanî tevahî gelên bindest dide. Şoreşa me 12 salên xwe li paş xwe dihêle û dikeve sala xwe ya nû. Her şoreş ji dîrokê ra dibe rûpeleka nû. Şoreşa Rojava jî bû yekemîn şoreşa sedsala 21emîn û di dîrokê da weke şoreşa jinê hat nexişandin.

Şoreşa Rojava ya ku weke parçeyek ji serhildanên gel ên Ereb ên 2010an destpê kir di destpêkê da di dîroka berxwedana gelê Kurd da û piştî wê bi tevlîbûna gelên bindest ên Ereb, Suran Ermen û hwd. di dîroka gelê bindest da bû rûpeleka zêrîn. Em dikarin bêjin ku dîroka rûpela şoreşên 21emîn bi şoreşa Rojava destpê kir.

Di vir da xala herî girîng ew e ku di dema ku di 2010an da serhildanên gel ên Ereb destpê kir û çirûska wan şoreşan gîhaşt Sûrî û Rojava gelo çima tenê di Rojava da ev serhildan bi şoreşeka gelparêz û azadîxwezîya jin gihaşt encamê? Bêguman li vir bersiva herî girîng bername û pêşengtîyeka şoreşger e. Rexmê ku şoreşên welatên Ereb ên din ji alî hêzên emperyalîst ve hatin dizîn û negîhaştin encamê li Rojava çirûska van şoreşan gihaşt asta serkeftinê. Di vir da hêmana herî girîng jî rêxistinbûna gel û jinan e. Çawa ku şoreşa Rojava ji têkoşîna gelê Kurd a deh salan ne serbixwe ye, şoreşa ku ji destpêkê da xisleta şoreşa jinê bi dest xistîye jî ji têkoşîna jinên Kurd a deh salan ne serbixwe ye.

Çirûska 19 Tîrmehê Kobanê

Şoreşa 19 Tîrmeha 2011an a ku destpêkê li Kobanê hat îlankirin û piştî wê belavî hemû herêmên din bû, dawî li mêtingerîya BAAS anî. Dîroka şoreşê bi berxwedan, û destkeftinan dagirtîye. Ji ber vê yekê ji roja xwe ya yekemîn da bû hedefa dewletên kapîtalîst û mêtinger û ev dorpêç îro hîna berdewam e. Di serî da bi destê komên çete yên wekî El Nûsra, HTŞ, Ehrar El Şam û hwd. hat xwestin ku şoreş bê fetisandin. Lê gelê Kurd ê ku bi salane di bin siyaseta mêtinger a BAAS da dijîya di bin siwana YXK û piştî wê di bin siwana YPGÊ, YPJê da rêxistin bû û ax û rûmeta xwe parastin.

Ji bo parastinê qasî avakirina artêşa leşgerî YPGê û YPJê ji bo misogerîya şoreşê avakirina qada civakî û sîyasî jî ew qasî girîng bû. Ji ber vê yekê di sala 2013an da hatin îlankirina kantonan gaveka dîrokî bû. Avakirina ku di sala 2011an da bi rêya komînan destpê kir bi avakirina kantonan, di vê qadê da dibe xaleka werçerxê.

Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê ye!

Şoreşa Rojava ya ku li dijî mêtingerîya BAAS û çeteyên faşîst ên hov têk bir, di heman demê da rêya azadîya jinê vekir. Di vir da jî xala herî girîng ew bû ku bi sedan û hezaran jinan hem ji bo parastina axa xwe, hem jî li dijî tarîtîya serdestîya mêr ku nasname û hebûna jinê tune kiribû rabûn ser pêyan û bûn pêşengên şoreşê. Jinan di ev şoreşa demokratîk da azadîya xwe dîtin. Jinên ku heta duh di navbera dîwarên mala xwe da, di bin zext û zilma serdestîya mêr, çanda malbatî û eşîrtî ya serdestîya mêr ku jin kiribû kole ji bo azadî, wekhevî û rûmeta xwe rabûn ser pîyan. Jinan bi vîn û xwebawerîyeka mezin hemû dijminên jinê perçiqandin. Bi hezaran jinên ku çek hildan bûn bingeha artêşbûna jinê ya YPJê û di dîroka têkoşîna jinên bindest da bûn navê serhildana jin.

Dîsa jin di her qada avakirina şoreşê da bûn pêşeng. Ji komînan heta meclîsan, ji sazîyên civakî yên xizmetê heta sazîyên rêveberîyê ji jêr da heta jor jin bi sîstema hevserokatiyê bûn vîn. Ligel pergala giştî di hundirê wê da pergala jinê ya xweser hat avakirin. Tevahî mafên ku jinan bi saya ked û bedêlên mezin bi dest xistin bi rêya zagon, hevpeymana civakî û zagonên jinê yên xweser hatin misogerkirin.

Li Dijî Êrîşên Li Ser Şoreşê Berxwedan

Di destpêka şoreşê da heta niha êrîşên li ser şoreşê berdewam in. Destpêkê hat xwestin ku şoreş bi rêya çeteyên wekî El Nûsra DAIŞ û hwd. bihê têkbirin. Lê DAIŞa ku bi hezaran çeteyên xwe xwest ku Kobanê dagir bike li hemberî vîna gelê Kurd û bi taybetî jî li hemberî vîna jinan têk çû. YPG, YPJ, MLKP û bi sedan şervanên enternasyonal li dijî hovitîya DAIŞê berxwedaneka bêhempa meşandin û serkeftina Kobanê di dîroka gelê bindest da bi tîpên zêrîn hat nivîsandin. Dikare bihê gotin ku DAIŞ û komên çete yên ku di destpêkê da bi alîkarî û piştgirîya dewleta Tirk û dewletên din ên kapîtalîst têkçûna xwe ye yekemîn di Kobanê da xwarin. Kobanê bû destpêka dawîyê. Piştî şerê Kobanê Girê Spî, Minbic, Şedadê, Hol, Reqa, Dêrazor, Hecîn û Baxoz ji dagirkerîya DAIŞê hat rizgarkirin. Bi tifaqa gelê Kurd, Ereb, Suryan, Ermen û jinan DAIŞa ku di cîhanê da bibû xewneka bitirs dawî li hebûna DAIŞê hat anîn. Dawîbûna DAIŞa ku dijminê jinê û gelên bindest bû di dîroka 2019an da bi pêşengtîya jinan weke leşgerî hat tunekirin. Şoreşa Rojava ya ku ber bi Bakur û Rojhilatê Sûrî ve fireh bû, bû rizgarîya tevahî gelên bindest.

Dewleta Tirk a ku bi piştgirîkirina DAIŞê dixwest şoreşê dorpêç bike û vîna gelan û jinan bişkîne, vê carê bi piştgirîya hêzên emperyalî yên navneteweyî bi xwe daket qadê. Dewleta Tirk ku di şexsê DAIŞê da têk çûbû hebûna şoreşa Rojava ya jin weke tunebûna xwe dibîne. Ev rastîyeka jî. Ji ber vê bi her awayî şer êrîşan tîne ser gelan û jinan. Bi piştgirîya dewletên emperyalîst dagirkirina Efrîn, Serê Kanîyê û Girê Spî mînakên ev xelekên dagirkerî û mêtingerîyê ne. Ji Kobanê, Şengal, Reqa, Efrîn, Girê Spî û Serê Kanîyê êrîşên ku tên kirin di heman demê da bi armanca şkenandina vîna jinê dihên kirin.

Lê li dijî van hemû êrîşên faşîst, dagirker û mêtinger şoreşa me li ber xwe dide û hîna ji bo gelên cîhanê yên bindest û tevahî jinên bindest rêya azadî û wekhevîyê nîşan dide. Xwedî li derketina şoreşa jin xwedî lê derketina dîrok û pêşerojê ye. Pêşengên vê şoreşê yên ku bi herikandina xwîn û keda xwe ev şoreş kirin şoreşa Rojava niha li me dinêrin. Parastin û mezinkirina vê şoreşê bangewazîya Silava, Arîn, Sarya, Avesta, Hevrîn, Destan, Raperîn, Avaşîn, Zîlan û Zehrayane. Wan dîrokeka dagirtî ji me ra hiştin. Pêwîst e ku em jî bangewazîya wan bê bersiv nahêlin.

12 sal berê şoreşa Rojava wek agir ketibû dilê Rojhilata Navîn. Ji bo vê şoreşê bi deh hezaran kesan canê xwe feda kirin. Jinên pêşeng ên komunîst ji destpêkê ve cihê xwe di şoreşê da girtin. Enî bi enî li dijî çeteyên DAIŞê şer kirin û ji bo şoreşa Rojava bedel dan. Ji bo damezrandina şoreşê ji komîn û komîngehan heta sazîyên tendurîstî di her qadê da kar û xebat meşandin. Erkên pêşengtî çi pêwîst dikir li gorî wê tevgerîyan û heta îro têkoşîna xwe berdewam dikin.

Ji destpêka şoreşê heta îro şervanên KKÖ (Rêxistina Jinên Komûnîst) pêşengtî ji şoreşê ra dikin. Ji bo parastina şoreşa Rojava ji Kobanê heta Reqa tevlî şer bûn. Sarya, İvana, Raperîn, Destan, Zîlan, İsyan... Şervanên KKÖ li dijî çeteyên DAIŞê bi hêrs û bi coş şer kirin. Di gelek qadan da rola xwe ya pêşengtî pêk anîn.

Şehîd Sarya li Rojava şehîdê yekemîn a jinên komunîst e. Sarya Özgür destpêkê li herêma Cizîr, piştre jî di berxwedana Kobanê da fermandarî kir û şer kir. Di şexsê Sarya Özgür da fermandarbûna jinê û fidayîbûn pêş ket. Di şerê Kobanê da ji bo qedandina DAIŞê pêwîst dikir ku leşgerên YPJê û YPGê pêş ve bimeşin, lê pêşîya enîya Başûr mayinkirî bû. Hevrê Sarya ji bo paqijkirina wê xetê çû û di dîroka 12ê Kanûna 2014an da şehîd ket. Tena piştî çend mehan hevrêyên Sarya dikarîbûn ku êdî biçin cihê ku lê nemir bû. Şer heta vê demê bi awayekî pir giran berdewam kir. Bi saya Sarya enî pêş da çû û ew xet ji DAIŞê hat rizgarkirin. Hevrê Sarya ji bo jinên komunîst di asta şahadetê da jî bû pêşeng. Piştî şehadeta Sarya gelek jin tevlî refên partîyê komunîst bûn.

Wekî Sarya Ivana Hoffmann jî di alîyê fidayîbûyîn da bû mînak. Ala şahadetê ji destê Sarya girt û pêş bi ve meşîya. Ivana şehîda yekemîn ya jinên enternasyonal a şoreşa Rojava ye. Ivana Hoffmann jî di refên MLKPê da wekî şoreşgereka profesyonel cihê xwe girt û têkilîya xwe bi pergala kapîtalîst ra di hemû alîyan da qut kir. Destpêkê li Qada Parastina Medyayê weke gerîlayeka azad perwerde girt û piştre tevlî şoreşa Rojava bû. Ivana Hoffmann di heman demê da LGBTİ+ bû. Yanê Ivana Hoffmann di alî zayendî da du caran bindest bû. Wê hemû derfetên Ewropa li paş xwe hişt û ji bo jiyaneka azad berê xwe da şoreşê. Di kesayeta xwe da jineka azad afirand û bû 'Avaşin Têkoşin Guneş'. Di cepheya Til Temirê da dema ku çeteyên DAIŞê êrîşa mewzîyên YPG-YPJê kir û sengera xwe bi qehremanî parast. Bi sîleha xwe ya bîksî heta guleyê xwe yê dawî şer kir û ji bo heval û azadîya gelên bindest canê xwe fida kir. Wekî ku di nameya xwe da nivîsand wisa bû rûyê enternasyonal ê partîyê. Bi saya şehadeta Ivana şoreşa Rojava di nav ciwanên Ewrupî û di nav tevgera şoreşgerên cîhanê da hîna bêhtir hat nasîn. Ivana di dîroka 7ê Adara 2015an da tevlî kerwana nemiran bû.

Şoreşa Rojava tena ne li axa Rojavayê Kurdistanê di heman demê da belavî axên Bakur û Rojhilata Sûrîye jî bû. Gelên Rojava û Bakur û Rojhilata Surîye ji bo azadî û wekhevîyê destê xwe dan hev û şoreş mezin kirin. Ev şoreş bû pira navbera gelan. Raperîn Dîcle wekî zarokeka gelê Tirk û Elewî di şoreşa Rojava da cihê xwe girt û tevlî hemleya rizgarkirina Minbicê bû. Hevrê Raperîn berî ku tevlî şoreşa Rojava bibe li Amedê di serhildana 6-7ê Cotmehê ya Kobanê da bi destê çeteyên Hizbulah birîndar bû. Li dijî çeteyên DAIŞê bi hezaran kîlometr dûrî mal û welatê xwe şehîd ket. Fikra komûnîzmê bê sînor e. Hevrê Raperîn li Bakurê Kurdistanê dest bi meşa xwe ya azadîyê kir. Di gelek qadan da bedel da û di dîroka 25ê Hezîrana 2016an da li ser axên Bakur û Rojhilatê Surîye bû nemir. Piştî rizgarkirina Minbicê mezinbûna agirê şoreşê berdewam kir.

Hevrê Destan Temûz (Ayşe Deniz Karacagil) di 30ê Gulana 2017an da di hemleya rizgarkirina Reqayê da şehîd ket. Şehîd Destan li Tirkîye di serhildana Gezîyê da teva ciwanên komunîst li dijî zilma dewleta Tirk tevlî berxwedanê bû. Dema ku heval Destan a ku weke keçika laçik sor dihat naskirin li Reqayê wekî şervaneka tabura enternasyonal a azadîyê bû nemir, wateya şoreşê careka din derket holê. Hevrê Destan nîşan da ku jinên komunîst ji Gezîyê heta Reqayê pêşengtîya şoreşê dikin.

Di têkoşînên çînî da ala sor ji destekî derbasî destekî dibe û ev têkoşîn bi bedelên şehîdan careka din mezin dibe. Şehîd Zîlan (Elende El Mihemed) ji şehadeta Destan Temmuz pir bandor bûbû û ew weke ciwaneka Rojavayî tevlî refên MLKPê bû.

Hevrê Zilan ji bo rêxistinkirina civakê gelekî erk rakir. Wê weke ciwaneka ji Kobanê di nav jinên ciwan da bi coş û hêz xebat kir. Mal bi mal civîn rêxistin dikir, kolan bi kolan danasîna xatê KKÖ kir. Taybet di nav jinên ciwan da ji bo qutbûyîna ji jiyana kapîtalîst mînakeka pir mezîn bû. Hevrê Zîlan Destan di dîroka 12ê Hezîrana 2021an da li Qamişlo şehit ket.

Şehîd İsyan di sala 2022an da bû nemir. Ew piştî komkujîya Pirsusê tevlî Şoreşa Rojava bû. Ew tevlî berxwedana Efrînê bû. Şehîd İsyan weke jineka trans pêşengê LGBTÎ+an bû. Ew jî wekî Ivana Hoffmann di alî zayendî da bindest bû. Ji ber vê yekê tevlîbûna wê ya şoreşê pir watedar bû. İsyan Tolhildana Pirsusê li dijî zilamperestî û pergala kapîtalîzmê û di heman demê da li dijî heteroseksîzmê her tim xeta berxwedanê mezin kir. Hevrê İsyan Tolhildana Pirsusê di dîroka 8ê Gulanê 2022an da şehîd ket.

Şervanên KKÖ ji destpêkê da heta îro şoreşa Rojava diparêzin û ji bo parastina şoreş û mezinkirina şoreşê bedel dide. Heta îro gelek hevrêyên me yên KKÖyî di sengerên şer da derbasbûn. Hinek ji wan şehîd ketin. Berçem û Şirin li dijî dewleta Faşîst bûn sembola vîna jinên komûnîst. Roza, Arjîn û Sarîn di şoreşa Rojava re derbas bûn û berê xwe dan çîyayên azad. Li dijî artêşa mêtinger ji bo Kurdistana azad û sosyalîst weke fermandarên jin şerkirin û canê xwe fidakirin. Hevrêyên KKÖyî di her qadê da têkoşîna xwe berdewam dikin û ala komûnîzmê bilind dikin. Ev şoreş bi saya fidayîyên şoreşê, bi saya şehîdan ava bû.

Yekîneyên Parastina Jinê (YPJê) Misogerîya vê Şoreşê ye

YPJ di 4ê Nîsana 2013an da hat avakirin. Damezrana wê ya di 4ê Nîsanê da ne rasthatinîyeka. Li ser felsefeya rêberê gelê Kurd Ebdulah Ocelan hat avakirin.

Axên Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûrîye di bin bandora paşverûtîyê da bûn. Jin di bin zexteka giran da bûn. Lê di dema şoreşê da bi pêşengtîya jinên Kurd şoreşa jin pêk hat. Jinan di nava hêzên xweparastinê da xwe rêxistin kirin. Gelek jinên ciwan ji bo ku li dijî çeteyên DAIŞê şer bikin çek rakirin. Dema ku jinên bindest amûrên xwe yên dijwar ji bo bidestxistina azadîyê bi kar tînin, hişmendîyeka din jî diafirînin. Ji ber ku bikaranîna çekan ji bo qutbûyîna rolên ku hatine ferbûyîn a jinan da gaveka mezin e. Tevlîbûyîna şer û berxwedanîya li dijî çeteyên hov di jîyana me serûbin bûyînek afirand. Li vir hebûna YPJê roleka sereke dilîze. Em ji bindestîya malbatê û jîyana eşîrî xilas kir. Em tevlî YPJê bûn û bi wê ra me têkilîyên azad û wekhev ava kirin. Bi hevaltîya jinê vîn û hêza me zêde bû. Em cesaretê ji hev digirin. Zordestîyê cihê xwe da azadîyê.

Salên yekemîn ên şoreşê ji bo jinan gelekî zehmet bûn. Civak destpêkê de neelimî vê yekê. Li gel her jineka ku tevlî YPJê bû civak bi rewşeka nû ra rû bi rû ma. Jinên ku heta duh wekî hêz nedihatin dîtin, îro bi lehengî şer dikirin. Ew jinên bindest ev welat ava kirin. Ji ber vê yekê wateya YPJê mezin e. Jinên ciwan her ku şer kirin xurtir bûn. Gelek şehîd hatin dayîn. Mêran jî dît ku jin çiqasî bi hêz dikarin şer bikin. Wêrekîya jin û jinên ciwan ên di şer da morala her kesî bilind kir. Jinan di şerê li dijî DAIŞê da roleka stratejîk lîstin. Çeteyên DAIŞ'ê çeteyên paşverû yên ku deshilatdarên mêr in. Li ser navê îslamê jin kirin kole. Wan hema hema her tiştê jinan haram ragihand. Bi destê jinekê mirin heram e, bihîstina dengê jinekê heram e, xwerina ji destê jinê haram e. Di şer da jin jî revandin û di sûkên koleyan da firotin. Tecawîz ji bo xwe weke maf ditin. Çeteyên DAIŞê li hemberî jinan gelek sûc kirin. Ev sûcên li dijî mirovahîyê bûn. Çeteyên DAIŞê di serî da ji alîyê dewleta Tirk a mêtinger ve dihatin xwedîkirin. Hêzên emperyalîst her tim bi dizî piştgirî didin.

DAIŞ komeka çete yê dijminê jinan bû. Li cihên ku dagir kiribû destavêtina jinan dikir. Destdirêjî, tacîz, revandin hwd. Jinên Êzîdî li bazarên koleyan difirot. Hîna jinên Êzîdî yên winda hene. Di dîrokê da gelê Êzîdî bi xwedênenasîbûnê hatine sûcdarkirin. Jin û gelê Êzîdî bi mirin û komkujîyan ra rû bi rû man. Yekîtiya Jinan a YJŞê di şerê li dijî DAIŞê da hatîye avakirin. Di 13ê Mijdara 2015an da Şengal ji çeteyên DAIŞê hate rizgarkirin. Bi sedan jinên Êzîdî beşdarî vî şerî bûn. Gelek jinên ciwan ên ku ji alîyê DAIŞê ve hatin revandin û rizgarkirin, di nava yekîneyên YJŞê da berxwedanîya xwe berdewam dikin.

Dema ku DAIŞê dest bi êrîşên xwe kir, dibe ku em di destpêkê da tirsîyan. Hin ji me hebûn ku neçar man koçber bûn. Me malên xwe winda kirin, malbatên me ji hev qetîyan. Û her ku ev şer bi pêş ve diçû, me fêm kir ku ev zordarî tenê bi berxwedanê bi dawî dibe. Tirs tenê me nêzî komkujîyeka din dike. Komkujî, zilm, tundî, şkence, tecawîz hwd hebû. Jin çawa dikarin li hemberî vê xirabîyê bêdeng bimînin? Têkoşîna li dijî DAIŞê di destpêkê da ji bo me pêwîstîyek bû. Dema ku şer kir, me fêm kir ku bi salan me hêza xwe nas nekiribû.

Me bi leşkerîbûnê hêza xwe eşkere kir. Em jinên wêrek in, lê tena cesaret têre nake. Em bêyî rêxistin nikarin li dijî serdestîya mêr û paşverûtîyê şer bikin. Ji ber vê yekê YPJê jî ji bo me misogerîyeka. Ên ku di destpêkê da ji me bawer nedikirin, hêza me bi şehîdên pêşîn ra dîtin. Taburên me yên ku di serî da li Cîndiresê hatibûn avakirin, bi lezûbez li kantonên Kobanê û Cizîr hatin avakirin. Di destpêkê da hem şer berdewam dikir, hem xebatên rêxistinî didomin. Her ku dem derbas bû pergalên me pêş ketin. Bi demê ra hejmara jinên ku tevlî me bûn zêde bû. Me di hemû warên teknîka leşkerî da jî şervan perwerde kirin. Şervanên me yên ku di gelek waran de pispor in hene. Me di gelek waran da, ji çekên ferdî bigire heta pergalên parastina hewayî, wesfên me zêde kirin.

Piştî têkçûna DAIŞê di alîyê tevlîbûnê da kêmasî derketin. Disa jî niha hejmarê me zêdetirî pênç hezar e. Dema ku şoreş li ser axa Bakurê Rojhilatê Sûriyê belav bû, bi taybetî jinên Ereb dest bi tevlîbûna YPJê kirin. Gelek jinên ciwan ên Ereb ji be bandora rêgezên eşîrî yên giran derketin û bûn şervanên azad. YPJê îro ji roja ku hatiye avakirin da xwedî avahîyeka pir cuda ye. Jinên ji gelek gelên wek Ereb, Tirkmen, Ermenî, Suryanî û Asûrî niha di artêşa me da dibin şervan. Zarokên van kesan bi hev ra şer dikin û xwîna wan bi hev re tevdigere. Şoreşa rast li welatê kurdan dest pê kir. Weke jinên Kurd bi salan e em li dijî mêtingerîyê li ber xwe didin. Em di vê berxwedanê de fêrî gelek tiştan bûn. Yekem çirûskên şoreşê li bajarên kurdan qewimî. Lê her ku şoreş mezin bû, me fêm kir ku serkeftinên herî mezin li cihên ku herî zêde jin lê hatine çewisandin dihên bi dest xistin. DAIŞ têk çû û li cihên wekî Reqa, Minbic û Derazorê azadî bi dest xist. Îro jinên wan bajaran çek hildigirin û şoreşê diparêzin.

Em Bi Hevaltîya Jinê Hevdu Hembêz Dikin

YPJê weke artêşa jinê yek ji mînakên pêşeng ên cîhanê ye. YPJê cihê ku jin lê azad dibin û ji serdestîya mêr hesab tên pirsin e. Li vir em bi hevaltîya jinê hevdû hemêz dikin. Em xwe azad dikin û pêş dixin. Zagonên eşîrî, zewacên bi temenê biçûk û tundî hîna jî di civakê da berdewam dike. Ji bo pêşvebirina şoreşa Rojava û parastina van destkeftîyan divê her kes piştgirîyê bide YPJê. YPJê misogerîya şoreşa Rojava ye. Divê hemû jinên ciwan tevlî YPJê bibin. Ev dê ji Tirk a dagirker û çeteyên wê ra bibe bersiva herî baş.

Em ê têkoşîna xwe ya ji bo hemû hevalên xwe yên şehîd, ji şehîda xwe yê yekem Silava heta Arîn Mîrkan, ji Sarya Ozgur heta Sozdaran bidomînin. Em ê ji tevahî kesên ku êrîşa şoreşa me dikin hesap bipirsin. Çawa ku me duh li dijî çeteyên DAIŞê bi awayekî fidatî şer kir, em ê îro jî li dijî her cureya êrîşan şoreşa xwe biparêzin. Em ê Serê Kanîyê, Girê Spî û Efrînê rizgar bikin. Ew axên me ne. Li van erdan cihê çeteyan tune ye! Em dizanin ev şoreş çawa hatîye afirandin. Ev şoreş hem ji bo me, hem jî ji bo jinên cîhanê hêvîyeka. Em ê heta dilopa dawî ya xwîna xwe şoreşê biparêzin!

Wê Bi Keda Jinên Ciwan Gulên Tîrmehê Bi Pêş Bikevin

Şoreşa Rojava ya ku weke şoreşa jinê tê nasîn, bi keda sed hezaran jin û taybetî jinên ciwan gihaşt asta serkeftinê. Di şoreşê da bi saya fedakarî û fedabûyina jinên ciwan gelek destkeftî hatin bi dest xistin. Pêwîst e dema ku ji me tê pirsîn 'gelo ev şoreş çima weke şoreşa jin hatîye nasîn?' em di vî warî de ked û lehengtîya jinan, ciwanan, jinên ciwan baş bidin nasîn. Şoreşa Rojava bi dirûşmeya "JIN JÎYAN AZADÎ" navdar bû û bi hezaran kes ji bo vê dirûşmeyê tevlî nava refên vê şoreşê bûn.

Berî ku şoreşa Rojava were lidarxistin bi hezaran jin di bin zext û tundiyê da derbas dibûn. Gelek mînakên ku em karibin bînin ser ziman hene. Gelek jinên ciwan ji ber çanda ev pergala baviksalar da bi sedemên kevneşop û bastanîyên eşîran da hatin qetilkirin.

Zexta ku li ser jinan ciwan tê meşandin bi rûmet û namûsê ve tê girêdan. Ji bo ku ragihandin kêm bû denga jinên ciwan dihate birîn. Heta ku şoreşa Rojava li dar ket denga jîyana me û êşên me nedihat naskirin. Ji ber vê yekê jin bi awayekî leheng tevlî şoreşê bûn û vê hişt ku herkes hêz û vîna jinê nas bike. Bêguman ne ku di jîyana me da tu pirsgêrêk nemaye û me di her warî da azadîya xwe bi dest xistîye. Lê em bi saya şoreşê gîhaştin jîyaneka nû rêya azadîyê vebû. Di nivîsandina destana vê şoreşê da gelek keda jinên ciwan heye. Bi avabûna artêşa jin û sazîyên jinan jin bûn xwedî vîn û maf. Pêwîst e ku herkes xwedî li mafên xwe derkeve. Heta niha em dibînin ku çanda sîstema eşîrtî li ber azadîya jinê dibin sînor.

Lê şoreşa Rojava ya jinê di jîyana jinan da bû sedema guhertineka mezin. Bi taybet ji bo jinên ciwan ên ku bûne pêşengên vê şoreşê û li dijî hemû pergalên desthilatdar u ferasetên desthilatdarîyên mêr û baviksalar serî hildan û serî netewandin. Ji bo jinên ciwan jîyan hîna zor u zehmet e. Lê tevî vê jî gelek jinên ciwan berê xwe dane vê şoreşê û xwe di qadên cur bi cur da bicihkirine. Dema jin di vê şoreşê da bû xwedî vîn û çek rakirin, şer kirin herkes matmayî ma. Pirseka wiha derket holê: "Gelo jina ku tenê ji bo karên mal û xwedîkirina zarokan hatîye dinyayê, dê çawa karibe derbasî cepheyên şer bibe? Jinên ku pêwîst e ku xwe tenê ji mêran xwe bixemilîne, di bin zexta wî da bimîne û bi koleya wî gelo dê çawa li hemberî dijmin li ber xwe bide?"

Lê weke her car vê şoreşê gelek tişt da îspatkirin ku bi hezaran jinên ciwan di dema xwe di nava refên vê şoreşê de cih kirin, li hember dijmin bi berxwedanî û têkoşîneka mezin li ber xwe dan u şer kirin. Em jinên ciwan niha di rêka jinên ku bûne sembolên vê şoreşê da dimeşin û em hêz û bawerîya xwe ji vê berxwedanîyê digirin. Pergala deshilatdarîya mêr û feraseta baviksalar ew qasî xurt bu ku, heta di şer da jî çeteyên DAIŞê nedixwestin bi destê jinan bimirin an jî tirsa wan a herî mezin li hemberî şervanên jin şkestina vîna wan e.

Çeteyên DAIŞê yên hov taybet Kobanê, Baxoz û li Reqaya ku paytexta wan bû li hemberî jinên ciwan têk çûn. Lehengtî û şerê jinên Kurd ên ciwan di hemû cîhanê da bû efsaneyeka mezin. Gelekî jinên ciwan ên enternasyonalîst ji welatên cuda hêz ji vê lehengtîyê girtin û berê xwe dan şoreşê. Ji bo bilindkirina dirûşmeya "JIN JÎYAN AZADÎ" şer kirin û şehîd ketin. Me weke jinên ciwan di her bihusteka axên vê şoreşê da ked daye û ji ber vê yekê em dibêjin vê di destpêkirina vê şoreşê da keda jinên ciwan gelekî mezin e û dê bi ked û berxwedana me jî bi ser bikeve.

Me ji bo destxistina azadîya xwe bi hezaran jinên ciwan spart vê axê. Li Reqayê Destan Temûz, li Til Temir Ivana Hoffmann, li Qamişlo Zîlan Destan û wekî wan bi hezaran jinên ciwan di oxira vê şoreşê da bûn nemir. Bi taybetî ji bo şoreşa Rojava rola şehîdên Pirsusê gelekî girîng e. Ji ber ku dijmin xwest ku bi vê komkujîyê di heman demê da yekîtîya jinan bişkîne, tirsekê di dilê wan da ava bike û ji şoreşê dûr bixîne. Di nav grupa bi sedan kesên ku dixwastin derbasî bajarê Kobanê bibin û berê xwe bidin şoreşa Rojava komeka jinên ciwan jî hebû. Di bin dirûşmeya "Me bi hev ra parast , em ê bi hev ra ava bikin" kom bibûn. Çeteyekî DAIŞê bi pîlansaziya dewleta Tirk xwe di nav ciwanan da teqand û 33ê hevrêyên me bûn nemir. Di kêlîya ku dirûşmeya "Em ji Arînan heta Sîbelan dimeşin ber bi serkeftinê ve" ya jinên ciwan dihat avêtin da komkujî hat pêk anîn. Lê ev komkujî li ber têkoşîna me nebû astengî. Em her yek Aydan, Hatice, Polen, Bûşra, Nûray, Ferdane, Nazegûl, Duygu, Ece, û Nazli ne.

Ji bo vê yekê jî dijmin dixwaze her dem êrîşên xwe bi taybet li ser jinên ciwan bide meşandin. Çi bi şerê taybet be, çi bi êrîşên çekdarî be li ser jinan bikar tînin. Bûyîna şopdarên şehîdên Pirsûsê tirsa dijmin e. Lê tu zilm, zordarî û rêbazên qirêj nikare li ber me bibe asteng. Ev şoreşa ku bi bedêlên mezin hate lidarxistin dê bi rihê wan bê parastin. Gelek jinên ciwan ji bo rakirina tola şehîdên Pirsusê ala sor hildan û rastî êrîşên faşîzmê hatin. Gelek jinên ciwan ji bo parastina şoreşa Rojava ketin ji zindanên dewleta Faşîst. Şoreşa Rojava bi van bedêlan pêş ket. Dijmin her tim ji bo ku me ji şoreşê dûr bixe vîna me hedef girt. Ji ber vê yekê gelek rêbazên ku ragihandin kêm bû denga jinên ciwan dihate birîn. Heta ku şoreşa Rojava li dar ket denga jîyana me û êşên me nedihat naskirin. Ji ber vê yekê jin bi awayekî leheng tevlî şoreşê bûn û vê hişt ku herkes hêz û vîna jinê nas bike. Bêguman ne ku di jîyana me da tu pirsgêrêk nemaye û me di her warî da azadîya xwe bi dest xistîye. Lê em bi saya şoreşê gîhaştin jîyaneka nû rêya azadîyê vebû. Di nivîsandina destana vê şoreşê da gelek keda jinên ciwan heye. Bi avabûna artêşa jin û sazîyên jinan jin bûn xwedî vîn û maf. Pêwîst e ku herkes xwedî li mafên xwe derkeve. Heta niha em dibînin ku çanda sîstema eşîrtî li ber azadîya jinê dibin sînor.

Lê şoreşa Rojava ya jinê di jîyana jinan da bû sedema guhertineka mezin. Bi taybet ji bo jinên ciwan ên ku bûne pêşengên vê şoreşê û li dijî hemû pergalên desthilatdar u ferasetên desthilatdarîyên mêr û baviksalar serî hildan û serî netewandin. Ji bo jinên ciwan jîyan hîna zor u zehmet e. Lê tevî vê jî gelek jinên ciwan berê xwe dane vê şoreşê û xwe di qadên cur bi cur da bicihkirine. Dema jin di vê şoreşê da bû xwedî vîn û çek rakirin, şer kirin herkes matmayî ma. Pirseka wiha derket holê: "Gelo jina ku tenê ji bo karên mal û xwedîkirina zarokan hatîye dinyayê, dê çawa karibe derbasî cepheyên şer bibe? Jinên ku pêwîst e ku xwe tenê ji mêran xwe bixemilîne, di bin zexta wî da bimîne û bi koleya wî gelo dê çawa li hemberî dijmin li ber xwe bide?"

Lê weke her car vê şoreşê gelek tişt da îspatkirin ku bi hezaran jinên ciwan di dema xwe di nava refên vê şoreşê de cih kirin, li hember dijmin bi berxwedanî û têkoşîneka mezin li ber xwe dan u şer kirin. Em jinên ciwan niha di rêka jinên ku bûne sembolên vê şoreşê da dimeşin û em hêz û bawerîya xwe ji vê berxwedanîyê digirin. Pergala deshilatdarîya mêr û feraseta baviksalar ew qasî xurt bu ku, heta di şer da jî çeteyên DAIŞê nedixwestin bi destê jinan bimirin an jî tirsa wan a herî mezin li hemberî şervanên jin şkestina vîna wan e.

Çeteyên DAIŞê yên hov taybet Kobanê, Baxoz û li Reqaya ku paytexta wan bû li hemberî jinên ciwan têk çûn. Lehengtî û şerê jinên Kurd ên ciwan di hemû cîhanê da bû efsaneyeka mezin. Gelekî jinên ciwan ên enternasyonalîst ji welatên cuda hêz ji vê lehengtîyê girtin û berê xwe dan şoreşê. Ji bo bilindkirina dirûşmeya "JIN JÎYAN AZADÎ" şer kirin û şehîd ketin. Me weke jinên ciwan di her bihusteka axên vê şoreşê da ked daye û ji ber vê yekê em dibêjin vê di destpêkirina vê şoreşê da keda jinên ciwan gelekî mezin e û dê bi ked û berxwedana me jî bi ser bikeve.

Me ji bo destxistina azadîya xwe bi hezaran jinên ciwan spart vê axê. Li Reqayê Destan Temûz, li Til Temir Ivana Hoffmann, li Qamişlo Zîlan Destan û wekî wan bi hezaran jinên ciwan di oxira vê şoreşê da bûn nemir. Bi taybetî ji bo şoreşa Rojava rola şehîdên Pirsusê gelekî girîng e. Ji ber ku dijmin xwest ku bi vê komkujîyê di heman demê da yekîtîya jinan bişkîne, tirsekê di dilê wan da ava bike û ji şoreşê dûr bixîne. Di nav grupa bi sedan kesên ku dixwastin derbasî bajarê Kobanê bibin û berê xwe bidin şoreşa Rojava komeka jinên ciwan jî hebû. Di bin dirûşmeya "Me bi hev ra parast , em ê bi hev ra ava bikin" kom bibûn. Çeteyekî DAIŞê bi pîlansaziya dewleta Tirk xwe di nav ciwanan da teqand û 33ê hevrêyên me bûn nemir. Di kêlîya ku dirûşmeya "Em ji Arînan heta Sîbelan dimeşin ber bi serkeftinê ve" ya jinên ciwan dihat avêtin da komkujî hat pêk anîn. Lê ev komkujî li ber têkoşîna me nebû astengî. Em her yek Aydan, Hatice, Polen, Bûşra, Nûray, Ferdane, Nazegûl, Duygu, Ece, û Nazli ne.

Ji bo vê yekê jî dijmin dixwaze her dem êrîşên xwe bi taybet li ser jinên ciwan bide meşandin. Çi bi şerê taybet be, çi bi êrîşên çekdarî be li ser jinan bikar tînin. Bûyîna şopdarên şehîdên Pirsûsê tirsa dijmin e. Lê tu zilm, zordarî û rêbazên qirêj nikare li ber me bibe asteng. Ev şoreşa ku bi bedêlên mezin hate lidarxistin dê bi rihê wan bê parastin. Gelek jinên ciwan ji bo rakirina tola şehîdên Pirsusê ala sor hildan û rastî êrîşên faşîzmê hatin. Gelek jinên ciwan ji bo parastina şoreşa Rojava ketin ji zindanên dewleta Faşîst. Şoreşa Rojava bi van bedêlan pêş ket. Dijmin her tim ji bo ku me ji şoreşê dûr bixe vîna me hedef girt. Ji ber vê yekê gelek rêbazên ku ragihandin kêm bû denga jinên ciwan dihate birîn. Heta ku şoreşa Rojava li dar ket denga jîyana me û êşên me nedihat naskirin. Ji ber vê yekê jin bi awayekî leheng tevlî şoreşê bûn û vê hişt ku herkes hêz û vîna jinê nas bike. Bêguman ne ku di jîyana me da tu pirsgêrêk nemaye û me di her warî da azadîya xwe bi dest xistîye. Lê em bi saya şoreşê gîhaştin jîyaneka nû rêya azadîyê vebû. Di nivîsandina destana vê şoreşê da gelek keda jinên ciwan heye. Bi avabûna artêşa jin û sazîyên jinan jin bûn xwedî vîn û maf. Pêwîst e ku herkes xwedî li mafên xwe derkeve. Heta niha em dibînin ku çanda sîstema eşîrtî li ber azadîya jinê dibin sînor.

